

Almanî êdî dixwazin Îslama Siyasî bê sîndarkirin

»»» R:7



Rojavayê Kurdistanê di bin beraşê çend pirskirêkan Kofixwar

»»» R:2

Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (460) 21-12-2023 Buha (1000) Tûmen

Totalîtarîzm li Îranê

»»» R:5

Kurdistan û dîroka serhildana şarîstaniyetê

»»» R:9

RAWESTAN LI HEMBER BARIMREGIRTINÊ

Li şerên di navbera 2 girûpên rikeber an dijhev, tevî ku ew şer rewa an narewa be, li bihora dîrokê de ji şewazên cuda, bo serketin bi ser aliyê beranber, mifah hatiye vergirtin.

Yek ji wan şewazan ku hertim bi şewazeke dûr ji exlaq hatiye hesabandin, li nav netewên cuda de barimtegirtin bûye û li gelek ji şeran de bi şewazên cuda hatine kirin. Wek mînak, Împerator û şahan li nav netewên şikestxwarî de, keç an xwişka desthilatdarê şikestxwarî wek hevjin bo heremserayên xwe birine ku bi şewazekê ew kes barimte bûye da ku ji serhildana wan an alîkarîdana wan bo dajminê şahê serkevtî li şer, rêgirî bê kirin ku li dema qewimîna rewşeke wiha, canê vê keçê dikevte metirsîyê.

Li şerî niha yê li navbera Îsrail û Hamasê, hêzên Hamasê hejmarek ji xelkê Îsrailê û geştyarên biyanî girtin û wek barimte bo tûnelên amadekirî yên Hamasê veguhaştin û li qonaxên cuda ên şer de wek alaveke danûstandinê bikar tînin û hinek caran jî wan wek mertalê mirovî li hember êrîşên Îsrailê de bi kar tînin ku heta niha çendîn kes ji wan, li wan cure êrîşan de hatine kuştin! an ji aliyek din ve milîsên Hamasê xelkê Xezê li pratîkê de

wek barimte bikar tîne ku rêgirî ji êrîşên berfirehtir ên Artêşa Îsrailê bike û bi wî awayî barimtegirtineke berfireh a bi milyon kesan li hember çavên dîrokê, tê kirin.

Mînakekî din ji barimtegirtinê, ji aliyê rejîma qurixkarê desthilatdar a Îranê anku rejîma "wilayeta feqih" ve tê kirin û bi salan e ku xelkê bo siyasîsetên xwe yên dije mirovî, wek barimte bi kar aniyê.

BARIMTEGIRTINÊ LI JÊR DESTHILATA REJÎMA ÎSLAMIYA ÎRANÊ DE BI ÇENDÎN ŞEWAZAN TÊNE KIRIN:

Barimtegirtin a bi eşkere û rastersat ku hêzên spaha pasdaran an îtilaata rejîmê, kesên biyanî li dema serdana wan bo Îranê, binçav kirine û li pêvajoyên cuda, çî li veguherîn digel terorîstên xwe ku li Amerîka an Ewropayê de hatine girtinê, an li beranber şandina diraf bo Îranê, ji wan barimteyan mifah vergirtiye.

Azadkirina çend milyar Dolar li Koreya başûr an zivirandina bikujên şehîd "Dr. Şerefkendî" û Dr. "Bextiyar" li Alman û Feransê bo Îranê an perdepoçkirina dosyeya terorkirina şehîd "Dr. Qasimlo" li hember ticareta çendîn milyar Dolarî ya neftê li navbera Otrîş û rejîma Îranê, mînakên


herî berçav ên nîşanderê siyasîsetên barimtegirtin ên wilayeta feqih in.

- Binçavkirina malbat û kesên nêzîk ên çalakvanên siyasî da ku bi vê rêyê, çalakvanan neçar bi bédengman û encamnedana çalakiyan li dijî rejîmê bibin.

- Barimtegirtina berfireh a xelkê ku her car dorpêçên aborî li dijî rejîmê hatine danê, rejîmê ew dorpêşane bo aliyekê kanalîze kiriye ku rasterast bandorê li ser jiyana xelkê bike û bi wî awayî li hember dorpêçên navnetewî, xelk li Îranê kirine mertalê mirovî. Li rewşek wiha de hertim aliyên ser bi rejîmê û kesên li jêr karlekêriya propagandeyên wan aliyan hebûne, li dijî dorpêçan helwîst girtine, lewma dorpêç wek dajminatî digel xelkê Îranê hesabandine! Bi wî awayî, rejîma dagîrker li pişt mertalê mirovî yê xelkê de xwe veşartîye û sedema bingehîn a rojreşîya xelkê, hatiye perdepoşkirin.

- barimtegirtina tevahiya jiyana xelkê: Wek mînak, vê cara dawiyê ku girûpekê alozî xîste nav sîstema pompên benzênê li seranserê Îranê, dubare hinek deng bilind bûn ku ew alozî û hekkirina sîstema pompên benzînan bi tenê xisarê bi xelkê digehîne û jiyana xelkê tûşê astengiyên kiriye!

- veşartina bikerên serkut



û cinayetan bi kincên medenî û danîna binkeyên terorîstî û ceribandînen spaha pasdaran li tax û deverên giştî ku bi wî awayî, her derbeyek bi spaha terorîst bikeve, bibe sedema derbepêketin bi xelkê û dubare hinek deng bilind bibin ku aramiya xelkê kevtiye bin gefê û jiyana xelkê ji nav diçe!

Bi wî awayî, pirs a bi barimtegirtin a li jêr desthilata rejîma Îslamiya Îranê û girûp û milîsên ser bi vê rejîmê, qeware û aloziyeke gelek zêdetir li xwe girtiye û encama vê gihîştîye qonaxekê ku her cure derbeyek bi vê rejîmê û milîsên terorîstî yên ser bi vê rejîmê, bi awayek xisarê bi xelkê barimte yên li destê wan de dikeve.

Terorîzma wilayeta feqih û milîsên ser bi vê rejîmê, li nav jiyana rojaneya xelkê de xwe veşartîye û xelk bi barimte girtine. Pirsyara bingehîn ew yeka ye ku li hember barimtegirtinên terorîstan de divê çî bê kirin?

Gelo divê metirsiya curek xisarpêketin bi kesên bê tawan jî qebûl bikin? Gelo divê li tevahiya qonaxên barimtegirtinê de bacê bidin? Her wek qonaxên destpêkî yên desthilatdariya rejîma Îranê li bajarê Tehranê ku li hember barimteyan de bac bi rejîma Îranê hate dan û ew rejîme hartir bû!

Li hember bi barimtegirtina balyozxaneyê Amerîka li bajarê Tehranê an barimteyên xelkê Firansê li dehika 60an a Rojî an bi barimtegirtina xelkê Kurdistanê û bombebarankirin û rakêbarankirina bajarên Kurdistanê, hêzên dijberî rejîmê bo nemana metirsiya zêdetir li ser xelkê, paşve çon û li hember de rejîma barimtegiyê Îranê siyasîsetên xwe yên barimtegirtinê, berfirehtir kirin.

An dibe ti karek neyê kirin û dest bi ser dest danên û bi hêviya mirina barimtegiyan bi awayê sirûştî bin ku renge li vê rojê, deriyek bo rizgariyê vebe û barimte aza bibin û xelk rizgar bibe!!!?

Peyama Navenda birêveberiya Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê bi hilkefta 26ê Sermawez, roja Ala û Pêşmerge Kurdiştanê

**XELKÊ XWERAGIR Û
PÊŞMERGERWERÊ KURDIS-
TANÊ!**

**PÊŞMARGÊN FÛDAKAR Û MÊRX-
WASE KURDISTANÊ!**

**MALBATÊN XWERAGIR ÊN
ŞEHÎDAN Û GIRTİYÊN SIYASÎ!**

26ê Sermawezê, roja "Ala û Pêşmerge Kurdiştanê" wek du hilkeftên siyasî û netewî, girêdayî bi dîroka 78 saleya xebat û tekoşîna Hizba Demokrat a Kurdiştan û nasnamexwaziya modern a gelê Kurd bi taybet li Rojhilkatê Kurdiştanê ye. Bi rêkevtî nine û teji şanaziye ku girîngtirîn û watedartî hêmayên netewî yên Kurd wek "Ala, Pêşmerge û sirûda Netewî" ji hundirê dîroka pir serfirazî a Komara Kurdiştanê û avakerê vê, anku Hizba Demokrat de ji dayîk bûn û bûne sembola netewî û nasnamexwaziya Kurd.

Îsal, 78 sal ji hildana Alaya Kurdiştanê li ser axa rizgarkirîya welat û navdêkirîna cengawerê neteweperwer û canliserdestê Kurd, bi "Pêşmerge" re derbas dibe. Roja "Pêşmerge û Ala" li rojîmêra Kurdî de bi tenê hilkeftê bo bi bîranîna du bûyerên dîrokî nîne, Belku girîngîdan bi "Ala" wek hêmayê nasnamexwazî û dana serweriyek berdewam bi "Pêşmerge" wek bi xortê herî bi helwêstî û fîdakare vê niştîmanê ye.

Diyarîkirina 26ê Sermawezê bi roja "Pêşmerge Kurdiştanê" ji aliyê Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê ve, selimandina vê bandorê bû ku hêza pêşmerge li hemû qonaxên xebata gelê me de û bi taybet li qonaxa bi şan a berevaniya çekdarî de hebûye û heye. Pêşmerge hêzeke mirovî ya xwebexş e ku li hundirê civaka Kurdiştanê bo parêzvanî ji bûn û nasnameya Kurd çê bûye. Dîtingeh û taybetmendiyên şoreşvanî û armanca rizgarîxwazane, henderê bingehînê vê hêza xwebexş bo parêzvanî li netewe û niştîman û heta cangorîkirin li vê rêbazê de ye. Bi vê pênasê, hunermend, jîngeparêz, mamosteyên zimanê Kurdî, jinî çalakvan û bivêr û tevahiya wan kesên ku xema wan ya mezî, netewe û niştîman e û xwe û canê



xwe û jiyana xwe li vê pêxemê de gorî dikin, li nava refa pêşmerge de tene hesabê.

Rola bihagiran a hêza pêşmerge li bilindgirtina Ala ya Kurdiştanê û parastina xebat û nasnameya Kurd li zaf dem û qonaxên dîrokî de wek serdema Komara Kurdiştanê, tevgera çekdariya salên 46-47 li dijî rejîma tepeserkar a paşatiyê û zêdetir ji 4 dehikan li dijî rejîma Îslamiya Îranê bal xelkê Kurdiştanê û li tevgera siyasiya Kurd de, cihê şanaziyê ye û şanaziya zêder ev e ku "Hêza Pêşmerge Kurdiştanê" li nêzî 8 dehikên derbasbûyî de her dem alahilgirê azadîxwazî, denokrasî û nîrxên mirovê bûye. Lewma hogirîya xelkê Kurdiştanê bi pêşmerge û xoşevaniya pêşmerge li nav gel de, wisa kirîye ku çepera pêşmerge bibe cihê evîndarên azadiyê û kur û keçên xwedî heste Kurd bi dilekî teji ji hivî û bi sehkirin bi çanazî ve, tevî refên pêşmerge bibin.

Hêza pêşmerge li asta herêmi û cihanî de jî navek naskirî û hevpeymanek xwedî pirêstîj bo hêzên demokrat û hevpeymanan e. Hêza pêşmerge Kurd li herêma Başûrê Kurdiştanê wek beşek ji hevpeymanîya li dijî DAÎŞê li şerê dije-terorîzma navnetewî de gelek nîrxên mirovî û canî daye û niha jî li vê çeperê de berevanî li nîrxên mirovî, demokratîk û cihanpeşend dike; Lewma li qonaxa niha ya xebata netewî û demeokratîka netewa me de jî, pêşmerge her wek hertim, remza xweragirî li hember sitem û zordariyî li dî-

tingeha navnetewî de jî wek hêzeke mafxwaz û berevanê azadî û aşitiyê tê nasîn.

Ji aliyê Navenda Birêveberiya Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê ve bi hilkefta vê roja dîrokî û teji serweriyê de tevî pîrozbahîyeke germ û teji berpirsaretî li hember gelê me, şanaziyê bi vê dikin ku dahênerê "Alaya Kurdiştanê û hêza Pêşmerge" weki parêzerê nasnameya Kurdî û nîrxên mirovî ên cihanî ne. Ev yeka jî cihê şanaziyê ye ku Hêza Pêşmerge Hizba Demokrat bi pêşkêşkirina zêdetir ji 5 hezar şehîdan ku li nav wan de rêberên jêhatî wek "Qazî, Qasimlo û Şerefkendî" û herwisa jan û mandîbûna hezaran girtiyên siyasî û malbatên serbilind ên pêşmergeyan û endamên Hizbê li navxwe û li derveyî welat, selimandîye ku li pêpxema serxistina xebata mafxwazane û serbilindî û serweriya gelê me de û li pêxema bexewerîkirina nivşên bê, li ti fîdakari û qurbanîdanekê xwe neparêze û heta gihîştin bi armancên bilind ên netewî û mirovî li çarçoveya pîrensîp û yasayên navnetewî de xebata xwe bidomîne.

XELKÊ XWERAGIRÊ KURDISTANÊ!

Tevgera mafxwazane ya gelê me li Rojhilkatê Kurdiştanê, zêdetir ji salekê û li pêvajoya şoreşa "Jîna"yê de pêngaveke dîrokî bo selimandina pêdegirî û nesekînin heta gihîştin bi armancên bil-

ind ên mirovahî û netewîyê hilda. Beşdariya bi komj a xelkê Kurdiştanê li nerizayetiyan şoreşvanî li vê heyamê de bi eşkere asta hişarî û çavvekirîbûna çîn û qatên cur bi cur ên Rojhilkatê Kurdiştanê da xuya. Şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî", wek bilindtirîn hawara mafxwaziya gelê me li 4 dehikên derbasbûyî de, hilgirê peyama û wateya giring him bo xelkê û hizbên siyasî yên Kurdiştanê û him bo rejîma Îslamiya Îranê ye ku em ji mêjve jî derbas bûne.

Li pêvajoya şoreşa "Jîna"yê de û li bûyerên piştê jî, rejîmê bi bikaranîna hemû şîyan û potansiyela serkuta hemûaliya xwe, ne ku nekarî hawara mafxwazane ya xelkê bifetisîne, belkî îrade û wireya şoreşvaniya xelkê bo qonaxeke nû veguhasî û gudariya hevpeymaniya gelê Îranê bihêztir kir û dirûşma afirankaraneya "Jin Jiyan Azadî" wek manîfestoya vê şoreşê, li kunc û qiraxên Îranê de bû hêvinê azadîxwazî û yekîtiya gelê Îranê û nîşaneyê derbasbûn ji Komara Îslamî.

Şoreşa "Jîna"yê salek û çend heyvan piştî destpêkirinê heta niha li deverên cuda yên pitguhavetiyan Îranê bi taybet li Kurdiştan û Belûçîstanê, tevê serkuta hovane û çendqatî bi berhevdanî digel deverên din ên Îranê, bi şewazên cur bi cur ên xebata si-

Peyama Navenda birêveberiya Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê bi hilkefta 26ê Sermawez, roja Ala û Pêşmerge Kurdiştanê

»»» R:2

yasî û medenî de rêkxiravtir û tundir tê kirin. Ew cudatiya hilgirê vê peyamê ye ku pirsê netewî û nasnameyî ku berhema siyaseta mezinîxwazaneya navendî li her du deshilatên paşayeti û Komara Îslamî de, pirsgirêka bingehîn a cografiyaya siyasî ya Îranê ye û bê çareserkirina vê sitema dîrokî û destbedan ji vê dîtingeha ewlehî, aramiya siyasî û aborî û civakî li Îranê de çê nabe. Bê şik îtirafkirin bi çend netewîbûna Îranê û dabînkirina mafê vekhev bo tevahiya netew û pêkhatiyên welat, diare derfeteke baş bo dariştina Îranê li ser binmyata bi fermînasîna zêdeyî û pêkanîna tolêransa siyasî û civakî wek hewcehiya demokrasî li Îranê de be.

Şoreşa Jîna li hemen demê de hilgirê îşareke girîng bo Kurd û tevgera siyasî ya Rojhilatê Kurdiştanê ye. Geşeya seha şoreşgerî û têgihîştina nivşeke taboşikên ku pêdegirî li ser azadiya suyasî û netewî dike, hewcehî bi pêdeçon nû pênasakirine nû heye û ew giraniyê dixe ser milê hizb û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdiştanê ku bi hevahengî û hevcehatî û xwerêkxiştinek heye ku bersivderê tevgera giştîya xelkê Kurdiştanê be; pêgeh giraniya birêveberiya vê şoreşê li Kurdiştanê de didin xuya.

HEVWELATIYÊN HÊJA!

Rejîma Îslamiya Îranê ji aliyek bi berdeyamî, mijûlê destêverdanên deverî û navnetewî ye û herwisa pêdegirî li ser geşedan bi projeyên navkî û mûşekî dike û li niha de jî bi sedema rolê kawilker li şerê Hamas û Îsraîlê de zêdetir bûye cihê nigeraniya civaka cîhanê. Herwisa bînpêkirina berdeyam a mafê mirovî bi taybet li destpêka şoreşa "Jîna"yê ve li asta navnetewî de bûye cihê şermazkirina rejîmê û danîna dorpêçên aborî yên zêdetir ji aliyê welatên Rojavayî û bi sedema wan siyasatên çewt, ku rasterast karlêkerî li ser rewşa jiyana û bijîwîya xelkê kiriye û nerizayetiya berfirehtir û rêkîstînkirîya çîn û qatên civakê li pey xwe aniye.

Berdewamiya wan nerizayetiyan ku berhema guhnedana dezgehên rejîmê bi daxwaziyan xelkê ye, rê bo rlxistina zêdetir a xelkê xweş kiriye. Şerxwaziyan rejîmê li derveyî sînorên Îranê û çêkirina şer li welatên deverê û heta dûrtir jî, civaka cîhanî bo yekhelwîstiya zêdetir li dijî wan siyasatan han daye û roj bi roj meydana manora rejîma Îslamî bertengtir kiriye. Li tenîştaya vê yekê de jî qurixkarî û gendeliyya aboriya qateke diyarîkirî ya serr bi dezgehên desthilatdariyê ku givaşeke ji astderketî xistiye ser xelkê kêma dahat û hejarê Îranê wek piraniya heşîmeta wî welatî, bûye sedema bêhêvîkirina xelkê ji çareserkirina pirsgirêkên wan. Bi giştî, siyasatên navxwe û derve yên rejîma Îslamiya Îranê li warê aboriyê ve ye rû bi hejartirkirina civakê û li warê siyasî ve rû bi jinavbirina azadîyan û serkuta zêdetir a azadîxwazan ve diçe. Ew yeka jî girîngî û hewcehiya yekxistina wizeya xebatkarî û yekîtiyê li praktîk de li hemû çîn û qatrên civaka Îranê de bo xebat li dijî rejîma Îslamî, zêdetir dide xuya.

PÊŞMERGE Û CIVAKA XEBATKAR Û XWDÎSEHA KURDIŞTANÊ!

Zindîragirtin û bihêzkirina binyatên netewî û rawestan li hember hemû curê sitemkariyê, rêkxistina civatgeh û piştevanîkirina hizra şoreşvanî û qahîmkirina bawerî bi paşeroja ronahî bo gelê me, ji erkên girîng û pêşetir ên pêşmerge û hemû qatêln civaka xebatkar a Kurdiştanê ye. Îro em hemû erkek dîrokî li ser milê me ye ku bervanî ji netew û niştiman, li xwe digre, parastina niştiman bo nivşên paşeroja Kurdiştanê û xemilandina netewê bo parêzvanî ji şanazîpêkirin û kesatiya netewî ya gelê Kurd e. Xebatkarên gelê me hewcehî bi hizrîn, pênuş û pêngavhildanên praktîkî li meydana hewldan bo berevanî li şana gel û çêkirina binatên giştîgirîkirina xebat û bihêzkirina berpîrsayetiya takê Kurd li hember pîrsên çarenivîssaz ên netewî me bikin û pêdegirî li ser vê xebastê, me bi armancên me nêzîktir dike.

Tevî pîrozbahîkirina dubare ya roja "Ala û Pêşmerge" li pêşmergeyên cangorî û hemû xelkê pêşmergeperwer ên Kurd-



istanê, li hember şehîdan û girtiyên siyasî û malbatên serbilind ên şehîdan, soza xwe nû dikin ku heta gihîştin bi armancên bilêind ên netewî, dest ji xebat û berevaniya berdeyam hilnegirin. Serbikeve xebata mafxwazaneya gelê me!
Bi şan be hêza pêşmerge Kurdiştanê!

Navenda Birêveberiya Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê
26ê Sermaweza 1402 a Rojî
17ê December 2023 a Zayînî

Berdewamiya wan nerizayetiyan ku berhema guhnedana dezgehên rejîmê bi daxwaziyan xelkê ye, rê bo rlxistina zêdetir a xelkê xweş kiriye. Şerxwaziyan rejîmê li derveyî sînorên Îranê û çêkirina şer li welatên deverê û heta dûrtir jî, civaka cîhanî bo yekhelwîstiya zêdetir li dijî wan siyasatan han daye û roj bi roj meydana manora rejîma Îslamî bertengtir kiriye.

Li tenîştaya vê yekê de jî qurixkarî û gendeliyya aboriya qateke diyarîkirî ya serr bi dezgehên desthilatdariyê ku givaşeke ji astderketî xistiye ser xelkê kêma dahat û hejarê Îranê wek piraniya heşîmeta wî welatî, bûye sedema bêhêvîkirina xelkê ji çareserkirina pirsgirêkên wan.

Bi giştî, siyasatên navxwe û derveyên rejîma Îslamiya Îranê li warê aboriyê ve ye rû bi hejartirkirina civakê û li warê siyasî ve rû bi jinavbirina azadîyan û serkuta zêdetir a azadîxwazan ve diçe. Ew yeka jî girîngî û hewcehiya yekxistina wizeya xebatkarî û yekîtiyê li praktîk de li hemû çîn û qatrên civaka Îranê de bo xebat li dijî rejîma Îslamî, zêdetir dide xuya.

Pêşmerge û civaka xebatkar û xwdîseha Kurdiştanê!
Zindîragirtin û bihêzkirina binyatên netewî û rawestan li hember hemû curê sitemkariyê, rêkxistina civatgeh û piştevanîkirina hizra şoreşvanî û qahîmkirina bawerî bi paşeroja ronahî bo gelê me, ji erkên girîng û pêşetir ên pêşmerge û hemû qatêln civaka xebatkar a Kurdiştanê ye.

Îro em hemû erkek dîrokî li ser milê me ye ku bervanî ji netew û niştiman, li xwe digre, parastina niştiman bo nivşên paşeroja Kurdiştanê û xemilandina netewê bo parêzvanî ji şanazîpêkirin û kesatiya netewî ya gelê Kurd e. Xebatkarên gelê me hewcehî bi hizrîn, pênuş û pêngavhildanên praktîkî li meydana hewldan bo berevanî li şana gel û çêkirina binatên giştîgirîkirina xebat û bihêzkirina berpîrsayetiya takê Kurd li hember pîrsên çarenivîssaz ên netewî me bikin û pêdegirî li ser vê xebastê, me bi armancên me nêzîktir dike.

Tevî pîrozbahîkirina dubare ya roja "Ala û Pêşmerge" li pêşmergeyên cangorî û hemû xelkê pêşmergeperwer ên Kurdiştanê, li hember şehîdan û girtiyên siyasî û malbatên serbilind ên şehîdan, soza xwe nû dikin ku heta gihîştin bi armancên bilêind ên netewî, dest ji xebat û berevaniya berdeyam hilnegirin. Serbikeve xebata mafxwazaneya gelê me!
Bi şan be hêza pêşmerge Kurdiştanê!

Navenda Birêveberiya Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê
26ê Sermaweza 1402 a Rojî
17Ê DECEMBER 2023 A ZAYÎNÎ

Ger hebe dadperwerî, heq digîje heqê xwe



N: Nûredîn Sofizade

Ev gotina berêde raşte ku bav û kalan gotine ku ger hebe dadperwerî "Edaleta raşteqîne" heqdar dê bigehe heqê xwe, lê mixabin piraniya caran ev edalet û raştî dikeve bi piyan û dibe qurbanîyê miamile û berjewendiyên û ev maf û heqê ku edalet bas jê diket û biryarê li ser der dike, dûre ji dadperwerî û raştîye.

Hinek caran heta welat û dadigehên herî demokratîk û pêşkevî jî dikeve bin bandora berjewendiyên demkî û abûrî bo xwe û welatê xwe, û edaleta raştî perdepoş dikin û bi berewajiyê heq û raştîyê biryarekê didin ku heq bi heqdar nayête danê, û carekê ji aliyê tawanbar ve bûye qurbanî, û carekê dinê jî dadigeh mafê raştîne wî berçav nagre û dîsan dibe qurbanî.

Renge gelek mînak li wê derheqê de hebinku em bas bikin, bo mînak Welatê Otrîşê li pêxema berjewendiyên ticarî de, perwenda terora Dr. Qasimlo û hevalên wî bînpê kirin û terorîst girtin û radeştî rejîma Îranê kirin.

[Bi taybetî wan welatên Ewrûpî hinde çavpoşî ji kiryarên terorîstîye rejîma Îranê kirin ku êdî bi aşkera rê didane Îranê ku ewrûpa bikete meydana cilîda terorîstan û dawî minak jî me dît ku welatê Bêljîkê Esedulla Esedî ku li dema danana bombê bi dijî rêkxistina Micahidîne Xelq de hatibû girtin û hate dadidgêhîkirin û mehkum bû, lê li hember berdana çend barmiteyên Bêljîkî ku weke girogan li destê rejîma Îranê de hatibûne girtin, ev terorîst anku Esedulla Esedî radeştî Îranê hate kirin.](#)



Terorîstên perwenda terora Şapûr Bextiyar û Kazim Recewî û dehan kiryarên terorîstîye rejîma Îranê li Ewrûpa û welatên herêmê de, ku li dema kiryara terorîstî de û bi destê xwîn digirtin, bi curekê çavpoşî jê dikirin û kevirê didanane ser û li ber ewê ku peywendiyên ticarî û berjewendiyên wan digel Îranê têk neçe, dibûne parek ji piroja cîbicîkirina sanahîtîre kiryarên terorîstîye rejîma Îranê bi dijî xebatkarên siyasî yên opozîsyona rejîmê.

Ev pêwajoya her bi wî awayî çêpêş heta ku kiryarên terorîstîye rejîma Îranê bo ser xudî wan û berjewendiyên wan xwe jî bûne gef û rejîma Îranê hinde destê wê vekirî bûye ku karîbû li piraniya welatan de girûp û torên terorîstî pêkbûne û heçî dema ku hez bike ji bona vergirtina îmtiyazan ji wan welatan, tenahiya wan dixiste ber gef û metirsîyê, lewma dema she bi gefa ser xwe jî kirin, kevtne berevaniya xwe parastîne û aşkera kirin û girtin û dadigêhîkirina terorîstên rejîma Îranê.

Hemîd Nûrtî yê bikuj û beşdarê sêdaredana Hezaran girtiyên siyasî li sala 1988an de li Îranê ku ji aliyê polîsê welatê Swîdê ve ev pitir ji 2 salane hate girtin û li ser daxwaz û şikayeta malbatên sedan girtiyên siyasiye ku bi bazpîrsî û hikmê Hemîd Nûrtî hatibûne sêdaredanê, li Swîdê hate dadigêhîkirin û puiştî dehan celese rûniştina dadigehê û bi beşdariya

şahid û şakiyan û berevankarên Nûriyê mirov kuj, di encamê de roja derbasbûyî dadigeha Swîdê bi awayekî serbixwe, hikmê xwe yê dawî li ser wê perwendê der kir. Vê dadigehê biryara hepsa heta-hetayî bo Hemîd Nûrtî da bi tawana Mirovkujî û beşdarî li cinayeta bi dijî girtiyên siyasî.

GERÇI HEMÎD NÛRÎ EMRAZÊ DESTÊ REJÎMA MIROVKUJE KOMARA ÎSLAMÎ BÛYE Û CÎBICÎKERÊ BIRYARA RÊBERÊN CINAYETKAR Û DÎKTATORE REJÎMÊ BÛYE, LÊ HEVDEM HIKMÊ LI SER WÎ MIROVKUJÎ, WEKE HIKMÊ LI SER RÊBERÊN REJÎMÊ Û REJÎMA MIROVKUJ LI TEWAWIYETA XWE DE TÊTE HESIBANDIN Û AŞKERA KIRINA RÛYÊ RASTÎNE CINAYET Û DIJÎMIROVIYA REJÎMA ÎRANÊ Û RÊBERÊN WÊ DEXIYE. HER LEWRA ME DÎT KU DEMÛDEST PIŞTÎ RAGIHANDINA WÎ HIKMÊ DADIGEHA SWIDÊ, MALBATÊN QURBANIYAN Û

ÊDAMKIRIYÊN DESTÊ REJÎMÊ Û AZADÎXWAZAN KEYFXWEŞIYA XWE NÎŞAN DAN Û WEKE SERKEVTINEKÊ BO XWE Û ŞIKESTE KÎ MEZIN BO REJÎMA TERORÎSTE ÎRANÊ HESIBANDIN.

Lê tiştê herî girîng eve ku bûye cihê nîgeraniya azadîxwazan û malbatên qurbanîyan, eve ku erê gelo tu bêjî Swîd jî li hember berjewendiyên demkî de, Hemîd nûrtî radeştî Îranê neke? Tu bêjî adet û kultûra ewrûpayî yan weke radeştîkirina bikujên perwenda Mîkonosê, perwenda terora Dr. qasimlo, Dr. Bextiya, Kazim recewî, Esedulla esedî wê dawiyê, Hemîd Nûrtî jî radeştî Îranê nekin û ev miamile û berjewendîxwaziya dubare nebe?

Li egera heçî miamile û satûsewdayekî di navbera Îran û Swîdê û radeştîkirina Hemîd Nûrtî bi Îranê, tenê yek tişt heye ku nayê guherîn ku ev jî raştîya edalet û wîjdanê ye ku her kes û xwedî wîjdanek û heta xudî Ewrûpayî jî dizanin, ku terorîstbûn û cinayetkar bûn û dijî mirovbûna rejîma Îranê êdî hinde mezin û aşkeraye ku bi azadkirina terorîstekê neyête perdepoşîkirin, Edalet û dadperweriya raştîne eve ku rojekî ne gelek dîr de hemî rêber û biryarderên rejîma dîktatore îslamî bikevne ber dadigeh û edaleta xelkê Îranê.

Totalîtarîzm li Îranê



N:Azad Kurdî

Emê di vê kurtenivîsê de balê bidin ser çawaniya pêkhatin û awayê desthilata totalîter an tevaxwaz li Îranê. Desthilatdariyeke hov û dîktator ku di 45 salên derbasbûyî de bûye sedema pêkhatina çendîn şoriş û nerazîbûnên berfireh li dijî vê rêjîmê.

Rêjîmên totalîtar an tevaxwaz û herwiha dîktator di cîhanê de awayek ji rêveberiya hikûmet û sîstema siyasî ne ku bi rêyên bikaranîna desthilatê û bi pêkanîna tirsê di civakê de, bi awayekî giştî di hemû kar û barên siyasî, hiqûqî, civakî, aborî, kultûrî û heta perwerdeyê de jî destverdanê dikin û dixin bin rikêf û çavdêriya xwe. Rêjîmên wiha atmosfera çavtirsandina hevvelatiyan dikin bingeha karê xwe. Di zêdeyî wan sêsteman de yek kes an komek ji mirovên hevbîr hemû desthilatan bi awayê reha rêve dibin bêy ku rastî çî lêpîrsînekê bihên û çî dezgeh û saziyeke demokratîk bikare wan sînardar bike.

Rêjîmên totalîter bona revayîdan bi desthilatdariya xwe ya ne demokratîk, ji xwe qanûnan çê dikin û bi vê rêyê ve di hemû astên jiyana taybet û giştî ya hevvelatiyan de destverdanê dikin û dixin bin çavdêriya xwe de.

Taybetmendiyên berçav ên van sîstemên daxistî gelek berçav in. Emê bi kurtî hindêk ji wan şirove bikin :

Propaganda û derevên mezin bi berfirehî belav dikin, dezgeha sîxorî û atmosfera leşkerî pêk tînin, berdewam dijminan ji xw re difirînin, hewlan didin ku serokê xwe pîroz nîşan bidin û bi her awayekê be desthilatdariya xwe biparêzin, jinavbirin û qedexeki-

rîna bîr û nerînên cudaxwaz ên dijberî wan, pêkanîna tirs û xofê bi rêya çavdêrî û girtinan, îskence û heta kuştin, terorkirin û herwiha darvekirinê.

Sansorkirina zaniyarî û nûçeyan û ji aliyekî din ve lidarxistina hilbijartinên ne azad û bi tevahî kontrolkirî ji aliyê dezgehên dewletî û destnîsankirina mohreyên xwe bo bi nav hilbijartinan, komkirina hindêk kesên berjewendîxwaz û bê kêr li derdora xwe û dayîna îmkânên aborî bona ragirtina wan.

Terxankirina budceyên xeyalî bona propagandayên derewîn li dijî dijberên xwe. Ev rêjîm mediya û çapemeniyê azad û rexnegir a desthilatê digirin û weşana wan qedexe dikin.

Govar û kitên û tora internetê û bidestxistina zaniyariyên durust tê sansorkirin û dixin bin çavdêriya dewletê. Girtîgehên wan rêjîman dagirtî ne ji zîndaniyên siyasî û kesên rexnegir, bijarde û elîtên civakê bi berdewamî welat bicî dihêlin û rêya koçberiyê digirin pêşberî xwe.

Mezinkirina kesekê di asata serok de û dayîna desthilatên bê sînor bi wî kesî. Hemû azadî û nirxên demokratîk tînan bînpêkirin û mafên mirovan bi awayekî sîstematîk tînan bînpêkirin û ferq û cudahîdanan dibe bingeha karê wan di nava pêkhatiyên civakê de.

Hemû wehldan bona neçarkirina xelkê bo beşdarîkirin di bi nav hilbijartinên ku ew rêjîm weke şano birêv dibin û bi vê rêyê dixwazin biselîmînin ku di nava civaka xwe de tînan hezkirin û qebûlkirin û civaka navdewletî bi vê rêyê bixapînin ! Bikaranîna hemû awayên tund û tûjiyê li dijî rexnegir û nerazîbûnên hevvelatiyan di dema xwenîşandin û serhildanan de û girtin û kuştina wan û ...



Zanayên zaniştî siyasî û civakî bawer in ku di nav corên rêjîmên totalîtar de, totalîtarîzma olî yan dînî ya herî metirsîdar û bi xeter e. Ji ber ku ev sîstem bi rêya bikaranîna mifahwergirtin ji ol, revayiyê didin desthilatdariya xwe ya hov û bi belavkirina bîr û hizrên olî, mayîna xwe li ser desthilatê misoger dikin. Mirov dikare bêje ku rêjîma Komara Îslamî ya Îranê xwediyê hemû wan taybetmendiyên sîstemeke totalîtar e.

Di pêvajoya dîrokê de, çî desthilatdariyeke tevaxwaz û dîktator nekariye temeneke dirêj bike.

Ji ber ku awayên desthilatdariya wan ligel normên mirovî û azad lihev nahên û di navbera gel û wan desthilatan de dijberî çê dibe û di encam de bi şorişan ji holê radibin. Piştî 44 salan ji desthilatdariya totalîter a olî li Îranê, şorişa Jînayê karî hemû tilism û biveyan tîk bişkîne û bi pêşengiya Kurdistanê û bi şorişa 'Jin, Jlyan, Azadî' rêjîma Îranê ligel lêgerên micid rûbirû bike û hêvî û îradeyê bide û vegerîne hemû pêkhatiyên cuxrafiya Îranê. Zû û dereng careke dine ev dengên nerazî dê serî hilbidin û darê zordarî û totalîtarîzma Îslamî ya Îranê tîk bidin.

Ji xeynî vê yekê jî çî çareyeke din nemaye. Bo vê armancê jî erkên hemû hevvelatiyan li navxwe, rêxistin û partiyeke siyasî yê nerazî û dijberî rêjîma Îranê giring û berçav e û divê xebatên micid û bernamêyên taybet bona hiloşandina vê rêjîmê bînan darêtin.



Min Divê her Tu Bilind Bî



N:Kofixwar

Ronahiya dil û çav

Diyariya dê û bav

Pêşîra wî roj û tav

Spehîtiya ax û av

Ala Kurdan ser be ser

Sor û gewr e kesk û zer

Mîr Dr. Kamiran Bedirxan

Ala Kurdistanê ji jor ve ber bi jêr li ser hev sê zemînan pêk tê. Di navendê de 21 tîrejên rojê heye ku hişyariyê, li jora wê rengê sor e ku xwîna lehengan û şoreş, hêz û yeksaniyê, navîna wê spî ye ku aşî û aramiyê, binê alê rengê kesk e ku ew jî welêt û parastîna wî, ciwaniyê rapêş dike.

Roja 17ê Kanûna Pêşîn (Çileya Pêşîn/Berfanbar) Ala Kurdan û Kurdistanê ye. Parlamentoya Kurdistanê di sala 2009ê biryar da ku êdî her sal roja 17ê Kanûnê (Berfanbar/Çileya Pêşîn/Kanûna Pêşîn) wek "Roja Ala Kurdistanê" were pîroz kirin. Ji wê demê heta niha li Başûrê Kurdistanê, li tevahiya Kurdistanê ji aliyê Kurdan ve bi coş û geş û tê pîroz kirin.

Bi taybet li Başûrê Kurdistanê di roja Ala Kurdistanê de, hemû bajar û bajarok bi Ala Rengîn tîn xemilandin û li hemû bajaran çalakiyên cûr bi cûr tîn lidar xistin.

Roja di 17.12.2023 de li Hewlêra paytext, bi boneya Roja Ala Kurdistanê çendîn merasimên fermî hatin saz kirin. Li baregeha Encûmena Wezîran bi amadebûna



Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, merasimê hat lidarxistin, ku tê de sirûda netewî ya "Ey Reqîb" hat xwandin û piştî bi awayê simbolîk Ala Kurdistanê li ber deriyê Encûmena Wezîran hat bilind kirin.

Di merasimê de, Serokwezîr Mesrûr Barzanî jî axavtinek kir û tede tekezî li ser parastîna nîrxên netewî yên Kurd û Kurdistanê û bi taybet Ala Kurdistanê kir.

“Pêwîst e em Ala Kurdistanê hertim hildin û xwedî lê derkevin û nabe nîrxên me yên niştimanî û netewî di jêr ti hincetekê de bîn şikandin. pêdiviyê hemû aliyên siyasî yên Kurdistanê, di jêr siya Ala Kurdistanê de û bi hev re berevaniyê li destkeftên xwe bikin

Bi kurtî dîroka Ala rengîn: Mîr Emîn Alî Bedirxan di sala 1919'an de rengên Ala Rengîn bijartîye. Di destpêka sala 1919'an de, li Stenbolê di civîneka Komela Tealî Kurdistanê de, bi serokatiya serokê wê yê duyemîn Mîr Emîn Alî Bedirxan ve biryar hat dayîn ku xaka Kurdistanê ji hêzên Tirk û

her dijminên din rizgar bikin. Divê ew ji Kurdistanê azad û serbixwe re Alek pêwîst bû.

Di vê civînê de Emîn Alî Bedirxan bi hevalên xwe ve rengên Ala Kurdistanê bijartin û wek vê ala niha amade kirin. Ku piştî qewirandina hêzên Tirk û neyarên din, wê Alê di asîmanê Kurdistanê azad de bilind bikin.

Heta sala 1999 an Ala Rengîn du û sê caran li asîmanê Kurdistanê bi rengên xwe ve xemilandiye û dilê welatîyên xwe xweş û geş kiriye. Lê mixabin her sê caran jî neyaran, dagirkerên kurdan serkeftinê kurdan tîk birine Ala Rengîn daxistinê û bin pê kirine.

Lewma Ala Rengîn her çi bibe heta hetayî rûmeta gelê kurdan e, divê her û her bilind bibe. Ala rengîn cara pêşîn di serê adara 1919'an de, bi şehîdê leheng Elîşer û Dr. Nûrî Dêrsimî ve Ala rengîn li Emraniya Dêrsimê, li ser çiyayê Qocgîrê hat bilind kirin.

Cara duyem di sala 1929–1930'an de, di van her du salan de Ala Rengîn li rex General Ihsan Nûrî Paşa û hevalên wî ve li ser çiyayê Araratê hatiye bilind kirin.

Cara sêyem jî di roja 22 /01 /1946'an de; di roja beyankirina komara Demokrat li Mehabadê ev Al ji rex Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî ve di navtara Çarçîra de hatiye bilind kirin. Lê cara çaran -heta îroj ku hêj bi dar ve ye- di roja 09/06/1999'an de, bi erêkirina Serokatiya Encûmenê Wezîran ve di hikûmeta Herêma Kurdistanê de, bi regekî fermî biryar hat standin ku Ala Rengîn her û her bilind bibe. Herwiha di roja 11.11.1999'an de bi biryarekê ve her sal roja 17ê meha Kanûnê (Berfanbar/meha 12 an) roja Ala Kurdistanê be. Ev roj roja ku Pêşewa Qazî Mihemed Ala Komara Mehabadê spartîye Barzaniyê nemir e.

Piştî vê biryarê jî di roja 17.12.2010'an de hikûmeta herêma Kurdistanê dîsa bi regekî fermî, keleha Hewlêrê bi Ala Kurdistanê ve xemilandiye. Ji vê roja şûn de li her 5 perçeyên Kurdistanê, li her derê cihanê li nav kurdan û kurdhêzan bi coş tê pîroz kirin. 17ê meha Berfanbarê bi aheng pêşwazî dikin û vê rojê bi navê Ala Kurdistanê dinasin.

Bi hêviya di Kurdistanê serbixwe de jîna di bin siya Ala Kurdistanê!

Nerîna Lîderan




“Benjamin Netanyahu”:

“Givaşa leşkerî him bo zivîrandina barimteyan û him bo alxahînbûn ji serketin li hember dujmin de hewce ye.”



“Volodymyr Zelenskyy”:

“Volodymyr Zelenskyy: Ez bawer im ku Amerîka sozên xwe yên li hember me dê bi tevahê bi cih bîne .”



“Vladimir Putin” :

“Vladimir Putin: Rûsiye Amadeyê danûsdandin digel Ukrayn, Amerîka û Yekştiya Ewropayê li derheq paşeroja Ukraynê ye”



“Josep Borrell”:

“Josep Borrell: hekî em derfeta serketina Rûsuyê li şerê Ukraynê û berdewamiya trajîdîya li Xezê bidin, projeya Ewropa dê bi awayekê bê vegeer dê rastî xisarê bibe”

Almanî êdî dixwazin Îslama Siyasî bê sînardarkirin



N. Eskender Ceiferî

Hin çalakvanên Almanî ji parlamen-toyên herêmên Almaniyayê dixwazin zêdetirî berê li hemberî Îslama Siyasî derkevin. Ew dibêjin egere metirsiya Îslama Siyasî wek mînak metirsiya rêjîma Îranê li ser azadiyê neyê naskirin, wê demê dê ji bo Ewropayê bibe pirsgrîreke mezin.

Berî heyamekê jî hin çalakvanên Almanî ji hikûmetê xwastibûn rêkarên tundtir bi kar bîne ji bo ku rê neyê dayîn Îslama siyasî li vî welatî pêş bikeve.

Ew çalakvan dibêjin ew kesên ku ji 2021'an ve heya dawîya 2023'an ji ber tundrewiyê hatine girtin, qet nehatine sizakirin.

Berî niha sala 2020an jin û zilamek hevregexwaz li navenda bajarê Dresdenê rastî êrîşê hatin ku di encamê de yek ji wan li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Ev kiryar û sedemên wê, beriya niha ji aliyê hêzên ewlehî û polîsan ve weke gefên îslametiye hatibûn binavkirin.

Roja 16ê Çiriya Pêşîn a 2020an mamosteyekî dîrokê ji aliyê îslamgîrek 18 salî ve li Conflans-Sainte-Honorine li bakurê rojavayê Parîsê hate kuştin. Ew ji ber nîşandana karîkatoreke Mihemed hate kuştin ku di kovara Charlie Hebdo de hatibû belavkirin. Wî mmamosteyî li ser mijara azadiya nerînan bi xwendekarên xwe re gotûbêj kiribû lê belê resmandina Mihemed ji dîtingeha şerîeta wan ve qedexeyê. Di encamê de jî bavê xwendekarekê û tundrewek îslamgir Fetwata kuştina wî mamosteyî dan. Roja 29ê Çiriya Pêşîn a sala 2020an 3 kes li kilîsayekê li Nizza hatin kuştin û 6 kes jî bi tundî hatin birîndarkirin. Tawanbar piştî ku hate girtin, hewara “Ellaho Ekber” hilda.

Ew çalakvan niha piştî çend salan dibêjin me sala 2023 jî qedand lê hîn wek pêwîst Îslama siyasî li Almanya nehateyê sînardarkirin.

Mezintirîn rêkxistina sîvîl ya Almanya ku wek Hevalbendên Çep tê naskirin, bi belavkirina daxuyaniyekê ragihand ku ew lidijî belavbû Îslama Siyasî ne û ew dixwazin rê li ber belavbûna



Îslamê li wir bê girtin.

Wan di destpêka daxuyaniya xwe de gotin ku em pir ditirsin ji ber ku xelk bi sedema hizrên nemirovane têne kuştin. Em aciz in ji ber ku ti rexneyek nayê girtin.

Jin û zilamek hevregexwaz li Dresdenê rastî êrîşê tîn lê belê ti kesek dengê xwe hîlnade. Serê mamosteyekî li Fransayê tê jêkirin lê dîsa jî hemû bédeng in. Êrîşek li Nizza bi kêr yan jî satorê hatiye kirin lê belê heya niha di derbarê wê de ti tiştê nehateyê gotin. Bédengî heye ji ber ku rê nayê dayîn bi mafên kesên din bileyzîn. Em li vir dibêjin: Êdî bes e!

Ew amaje jî dikin ku ew kesên ku têrorê dikin, piranî ji aliyê rêxistinên çekdarî yên têrorîstî yên bi navê Îslamê ve hatine perwerdekirin.

Hevalbendên Çep di beşeke din ji daxuyaniya xwe de gotin ku em naxwazin bédeng bimînin û lewma jî bi awayekî eşkere dibêjin: Îslamgirî, li dijî mirovahiyê ye.

Kuştinên heftiya derbasbûyî jî, ji vî yasayê cuda nebûn. Ew jî bi armanca pêkanîn û bikaranîna tundrewiyê bûn ku ji aliyê hin kesan ve hatin encamdan û di encamê de hin kes, ji mafên xwe yên mirovahiyê tîn bêparkirin.

Di berdewamiya daxuyaniyê de daxwaz ji Almaniyayê tê kirin ku ne pêşiya Îslamê, lê belê pêşiya tundgiriye bigire û dide xuyakirin ku divê li hemberî tevahiya wan kuştinan bi awayekî eşkere biaxivin ku bi hizrên tundrewane hatine encamdan: Ti bikujek, ji bikujekî din adiltir nîn e, ti qurbanî ji qurbanîyên din nêzîktir nîn in ji bo ku bibin armanc. Dijatiya mirovahiyê, têrorîstên rastgir û bikujên îslamgir kirine hevalbend. Kereb û kîn ji şaristaniyê, azadî, dêmokrasî û mirovbûn. Qurbanîyên van rastiyan jî hebvgirtî dibin ku mafê sereke yê jiyana wan, ji wan hatiye standin.

Xuya ye êdî Ewropî dixwazin bi rengekî cidî li hemberî têrorê derkevin.

Ew didin xuyakirin ku heke em bixwaze bi awayekî berdewam ji bo civakeke azad, ji bo mafên mirovan di asta cîhanê de û ji bo jiyaneke baş xebatê bikin, nabe bi ti awayekî li hemberî kuştina xelkê bê deng bimînin. Divê dengê xwe hildin û wek pêkhateyeke çepgir, nerazîtiya xwe nîşan bidin. Hekî bikuj îslamgir bin, divê em bikarin Îslamê rexne bikin.

Ew herwisa dibêjin her kesê ku Îslamî be, têrorîst nîn e lê belê ew dixwazin pêşiya Îslama Siyasî û tundgiriye bê girtin û tekezê dikin ku hekî em bê deng bimînin, wê demê em nikarin îdiaya azadiya cîhanî bicî bikin. Em weke projeyê dijberên faşîstan, bi rengekî eşkere li hemberî her cureyê bêbextiyê, helwesta xwe nîşan didin. Herwisa bi qurbanîyan re û bi wan kesan re ku hizrên mirovkujiyê bandor kirine ser wan, hev girtî ne.

Di beşa dawiyê ya daxuyaniya Hevalbendên Çep de hatiye, niha sala 2023an jî bi dawî hat û ne girîngî bi metirsiya Îslama Siyasî weke Hemasê û ne jî bi rêjîma Îranê hatiye dayîn. Lewma pêwîst e Ewropa û di seriya wê de Almanya rêkarên tundtir bigire ber xwe.

Rojavayê Kurdistanê û metirsiya nebûna projeyê Kurdî



N: Ebdulezîz Qasim

Niha wek dibînin li wî serdemî, bi gelemperî ku her çarçoveyek neteweyî, siyasî, aborî, rewşenbîrî li ser rûyê vê cîhanê, projeyek yan planek taybet yê bi rêkûpêk heye, yan pitir ji projeyekî ji bo pêkanîna armanc û berjewendiyên xwe yên taybet û rêveçûna digel karwanê pêşkeftinê û bidestxistina hokarên bihêzbûnê û berdewamiyê, herwiha rûbirûbûna her metirsiyeye siyasî, aborî, ewlekarî û rewşenbîrî, yan jî rûbirûbûna pirojeyên aliyên dijber û neyar, ji ber vê çendê ku her projeyekî serkeftî pêdivî bi rêkar û alavên hêz û sengiyê heye, ku ev yek jî li ser bingeh û binyatên bihêz û qahîm ava dibin.

Dema ku em vê xwendinê bi rewşa giştî ya siyasî û rewşenbîrî ya Rojavayê Kurdistan re didin ber hev û berawerd dikin, tevî rewşa parçebûn û bêtifaqiya siyasî, hevdem ku li ber çavan ti pirojeyekî Kurdî em nabînin. Herwiha ku ti xebatek rastqîn ji bo bidestxistina mafên gelê Kurd li Sûriyê jî nabe, zêdebarî ku aliyên di li ser qada Sûriyê projeyên xwe yên taybet hene û hindêk ji wan aliyan projeyên dijberî maf û hebûna gelê Kurd heye, bi taybetî rêjîma Sûriyê û hevalbendên xwe û Tirkîyê û opozîsyona Sûrî ya alîgirê wê.

Helbet nebûna projeyekî Kurdî, metirsiyên mezin li ser hebûn û siberoja miletê Kurd çê dike, netenê hîç projeyek Kurdî nîne, hevdem ku bi destên Kurdan xwe bi xwe pirsra neteweyî ji naveroka wê ya neteweyî tê berovajîkirin. Tevî ku beşek mezin ji partiyên kurdan bi aşkera xwedî li pirsra neteweyî dernakevin û xwe wekî hêzên Sûrî dibînin, beşê di xwe bi tenê bi projeyê neteweyî binav dike, bê ku xebateke rastqîn ji bo misogerkirina mafên gelê Kurd bikin.



Bi awayekî em dikarin bêjin rewşa siyasî û rêxistinî bûye bargiraniyek li ser gelê Kurd, helbet ku nebûna projeyekî Kurdî dibe derfet bo serkftina plan û siyasatên rêjîma Sûriyê û dagîrkerên Kurdistanê ji bo tinekirina miletê Kurd û bi heman awayî hewlên wan ji bo pûçkirina pirsra netewî ya Kurdî hêsantir dibe!


Ji destpêka sala 2011an ve û heta niha hîç pêkhatiyê sûrî, wekî kurdan tûşî zererê nebûne, pitir ji nîvekî miletê Kurd koçber bûye û nîveka axa Rojavayê Kurdistanê hatiye dagîrkirin ji aliyê Tirkîyê û çeteyên wê yên terorîst ve, tevî wê yekê jî hêj aliyên Kurdî negihiştine hîç rêkeftinekê ji bo parastina nivê mayî ji miletê Kurd û nivê mayî ji axa Kurdistanê.

Tevî girîngiya zêde ya yekrêziya Kurdî, niha û sibe û heta sed salên di, dubare, sêbare divê em bi gotin û bi kiryar pêdagiriyê li ser yekrêziya Kurdî bikin ku ji her tiştekî di girîngtir e, û ew kilîta serkeftinê ye, nemaze ku projeyên Tirkîyê û Îranê li Sûriyê li ser tinekirina pirsra neteweyî ya Kurdî û bêtifaqiya kurdan ava dibin. Divê projeyê Kurdî rê li hember projeyên wan bigire, ku îro ji her demekî di pêdiviya pirsra Kurdî bi hebûna projeyekî Kurdî heye, her wekî em dizanin ku heryek ji Tirkîyê û Îranê bi hemahengî digel Rûsiyê kar dikin di serî de ji bo tinekirina gelê Kurd û piştî bo dersînorkirina hêzên Amerîkayê ji Sûriyê, lê niha piştî şerê Xezayê, roj bi roj wisa diyar dibe ku rewşa Sûriyê û navçeyê jî dê bihête guhortin, dê rola Îran û Tirkîyê li qada Sûriyê lawaz bibe, ku dîsa derfetên baş dê peyda bibin ji bo bidestxistina mafên neteweyî yên gelê Kurd li Sûriyê, lê heger rewşa tevgera siyasî wisa bimîne û kar nebe ji bo yekrêziyê neteweyî û ji bo yekxistina nêrîn û gotareke siyasî ya hevbeş û yekgirtî, bê goman wê demê dê dîsa derfetên di siberojê de bêne pêş, dê çarenivîsa wan wekî çarenivîsa heman derfetên berê be, ku wê bêhûde li ber bayê biçin. Lewra bi dîtina min, ku aliyên Siyasî û Hizbî yên Rojavayê Kurdistanê bi siyasat û boçûnên xwe yên niha nikarin hêmanên hêzê û yekrêziyê peyda bikin û nikarin xwedî li projeyê Kurdî derkevin, heta ku derfet û delîve jî bîn û bo mafên gelê Kurd bibin hevdem û alîkar jî, her wekî Melayê Cizirî di helbesteke xwe de dibêje:

Her gel û seng dibitin zêr bi te dibirê hekîm
Qabliyet ku nebit hikmetê ustad çi ket?



Kurdistan û dîroka serhildana şaristaniyetê



N:Behzad Qadirî

Mêzopotamiya bi giştî û Kurdistan bi taybetî, yêk ji cihên kevnar û dîrokiye Rojhilata navîn û cîhanêne ku xwediyê dewlemendiyekî mezine ji tomarkirina dîroka çendîn hezar salî û hebûna herêmên cihvarên dîrokî û pir bihagiran in.

Di vê nivîsînê de ezê bi kurtasî behsa 3 gundên kevnar û xwedî dîroka hezaran sale li Kurdistanê de bikim ku dikare mînakî selimandina serhildana dîrok û jiyana û şaristaniyeta mirovahiye be, piştî jiyana mirovên destpêkî li Şikevtan de, dikare weke melbenda duyem a akincîbûna mirovan li Kurdistanê kevin de be.

Peydabûna gundên "Zaweyî çeme, Bêstansûr û Çermo" belgeya herî bi hêz a îsbat kirina jiyana asayî a pêşkevtî a mirovê berê li Kurdistanê de ku piraniya awayên jiyana derbas kirine.

GONDÊ ZAWÊ ÇEMÊ

Ev gunde dikewe başûrê şikevta Şanederê li ber etega çiyayê Biradost li parêzgeha Hewlêrê û dîroka wê jî vedigere bo 12 Hezar salan berî Zayînê. Ew gund gundekî cihê werzigarî bûye û xelkê wî gundi Genim û Nîsk çandine û Pez û Terş xwedî kirine. Gorî belge û lêkolînan ew gunde 10 mal bûye û texmîn tête kirin ku 30 kes tê de jiyabin.

GUNDÊ BÊSTANSÛR

Ew gunde kevtiye 27 Kîlometriya başûrê rojhilat a bajarê Silêmaniyê û yek ji gundên herî kevnê werzigiya Kurdistanê ye ku heta sala 1947an ji aliyê birêveberiya cihvarên kevnê îraqê weke Girekî cihvarê kevn hati-bû nasandin, lê di sala 2012 şûnde bi sedema lêkolîna tîmeke cihvarnasîna Ewropa ku pêkhatibû ji "Rocer Matiyos û Wêndî Matiyos" îsbat bû

ku gundê Bêstansûr gundekî werzigarî bûye ku dîroka wê vedigere bo 8 Hezar salan berya Zayînê.

Gorî wan lêkolînan ku li çend salên derbasbûyî heta niha li ser gundê Bêstansûr hatî kirin, îsbat bûye ku akincîbûna mirov li wî gundi de, vedigere bo serdemê "Holosyn" sedema wê jî eve ku li wî serdemî de pilên germê berbi bilindbûnê ve çone û zaf çavkaniyên Avê derkevtine, ev yeka jî bûye sedemê wê hindê mirov ji Şikevtan derkevin û cehdê bikin bona akincîbûna hertimî û karê werzigarî û terşdariyê bikin.

Weke xûya xelkê wî gundi werzigarî kirine û Genim û Ceh û Nîsk û Nok çandine û Pez û Beraz xwedî kirine û xaniyê xwe pê Kevir û Heriyê çêkirine. Yêk ji sedemên herî girînge çêbûna şaristaniyetê li wê herêmê de vedigere bo hebûna çavkaniyên Avê û ev sedeme heta niha jî jêderê girînge avdaniya wê herêmê ye. Lewra berê de mirov li vir kom bûye û şaristaniyet û qonaxekî nû a dîrokî li vir çê bûye. Belgeyên bêtir bow ê sedema serekî, hebûna 3 Girên kevnarên dine ne li nêzî gundê Bêstansûr ku belge ne li ser giringiya wê deverê bo karê werzigarî û çandiniyê û avedaniyê.

Pêdiviyê base ye ku "Rocer Matiyos" Pirofisorê cihvarnasîyê li Zankoya Ridîng derheq bi gundê Bêstansûr ragihandiye: Ev gunde anku Bêstansûr' jî gundê Çermo kevintire. Me hinek cihvarên kevn peyda kirine ku qonaxa veguheştinê nûşa me dide ku mirov jî Nêçîrê ve berbi werzigarî û çandiniyê ve çoye. Destpêka jiyana cotkariya mirovahiye li vir bûye. Ev dera vedigere bo çaxê Kevirîn li dawiya çaxê Cemedê.

GUNDÊ ÇERMO

Ev gunde nêzî gundê Kanî Sard kevtiye 11 Kîlometriya rojhilatê bajarê Çemçemalê li parêzgeha Silêmaniyê û destpêka jiyana li wî gundi de vedigere bo 7 Hezar salan berî Zayînê.



Ew gunde 30 mal bûye ku akinciyên wê gorî texmînan 150 kes bûye. Rûberê wê 1200 bo 1600 metrên çwargoşeye û 800 metran ji asta Behrê bilindtîre.

Xelkê wî gundi jî çandiniya Genim, Ceh û Nîskê kirine û giringî dane Darên Berû û Fistiqê û Pez û Beraz xwedî kirine. Herwisa ji wan alavên ku di wî gundi de hatine peydakirin, xelkê wî gundi karê raçandin û tevnê kirine û karê Rîs wehûnandinê zanîne.

Li seranserî wê pêgehê, cihvarê 12 gerên şaristaniyetê hatine peydakirin. Piraniya cihvarên gundê Çermo yê 2 gerên kontirola wê pêgehêne ku hevdem bûye digel şaristaniyeta Şanederê.

Herwisa xelkê wî gundi çend amûrek bikar anîne ku ji cure Kevirê hatine çêkirin ku bal Gola Wanê destdikevin. Hinek tiştên dine jî hatine peydakirin ku li Kendavê ve hatine û ev yeka jî dide xuyakirin ku gundê Çermo bazirganî û alûvêr digel herêmên dine de kirine.

Li dawiyê de hewceye amaje bi wê yekê jî bête kirin ku li sinûrê parêzgeha Silêmaniyê pitir ji 600 deverên cihvarên kevin hene û li parêzgeha Helebçê û herêma Şarezûrê jî pitir ji 100 herêmên cihvarên kevnar hene û ewane jî dîroka kevnare Kurdistanê didne selimandin û xûya dibe ku Kurdistan û akinciyên wê ku bingeha wê netewa Kurde li ser axa xwe, xwediyê dîrokekî kevnê şaristaniyet û pêşkevtina mirovahiye ye.



Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriyayê Mamosta Mûsa Zaxuranî koça dawî kir.

Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriyayê Mamosta Mûsa Zaxuranî yê navdar bi (Bavê Gulê) li Hewlêra Paytext koça dawî kir.

Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriyayê Mamosta Mûsa Zaxuranî koça dawî kir.

Nuçe Belav bike

Roja 19.12.2023, Helbestvan û Nivîskarê Kurd, endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriyayê Mamosta Mûsa Zaxuranî yê navdar bi (Bavê Gulê) li Hewlêra Paytext koça dawî kir.

Mamosta Mûsa Zaxuranî, xelkê devera Qamişlo ye û li sala 1955 li gundekî nêzîkî Qamişlo ji malbateke kurdperwer jidayîk bûye.

Di sala 1968an ve dest bi karê siyasî û nivîsînê kiriye û karê mamostayê (perwerde) kiriye, û 3 pertûkên çapkirî hene, bi egera nexweşiya xwe di jiyê 68 salî de, îro roja sêşemê 19.12.2023 li nexweşxaneyê Hewlêr çû ber dilovaniya Xwedayê mezin û xatirê xwe ji diniyayê xwest.

Bila cihê Mamosta Bavê Gulê behîsta pan û berîn be û serê malbata wî û gelê kurd sax û selamet be.

Qamişlo 19.12.2023

Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriya

Kurtejiyana helbestvan Mûsa Zaxuranî..

Helbestvan û nivîskar Mûsa Zaxuranî Mûsa Osman Xelef naskirîye bi Mûsa Zaxuranî di sala 1955 an de hatiye jiyane, li gundê letîfiyê, li ser sînorê tirkîyê û sûriyê, rojhilatî qamişlo bi 8 k.m.

Xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe xwend, û her şeş salên din li dibistanên qamişlo xwend, û di sala 1973 an de bekeloriya wergirt.

Li çend cihên din gelek korsên xwendinê birine, nemaze li ser markisîzmê û tevgera karkerê cîhanê û aboriya siyasî ... hd.

Her di wan korsan de di nav yekemînan de bû.


Ji sala 1969 an ve helbest bi kurdî û erebî hûnandin e.

Di gelek rojname û kovarên kurdî de nivîsiye, û helbestên wî hatine bilav kirin di van kovaran de : (metîn – sitêr – gelawêj – gurzek gul – zanîn – peyman – rojhilat – peyv – xebat – teaxî – roj ... hd).

Di hemî festîvalên helbestî de beşdarî dikir û di hemî bîranînên xebatkarên kurd û şîn û şahiyên gelê kurd de amade dibû.

Endamê komîta mehrecana helbesta kurdî li sûriyê ya sala 2007 an de, yek ji damezênerê koçka qamişlo ya çand kurdî ye.

Hemî cûrên helbestê û li ser pir babetan helbest hûnandine, û gelek êş û girtin û lêdan xwariye di ber kêşa kurdî de.



Her wiha di sala 2011 de ji ber ku beşdar dibû di hemû xwepêşandinên li dijî rêjîma sûrî çî bi şev û çî bi roj, û dema ku ji herêma kurdistanê vegeriya li qapiyê qamişlo û misêbînê hate girtin, bi zinan zindan gerandin ta li zindana (el feyha) qefandin, her di wê demê de gelek zorî û lêxistin û êşandin û işkence kirin dîtîye, û her li hemû navend û senterên polîs û emîn û asayîşan de lêdan ji rêjîmê xwariye û zor lê hatiye kirin ji qamişlo ta zindana (filestîn).

Her wesa ji bo mafê gelê kurd û kurdistanê di gelek şandan pişikdar bû û her li pêş bû, û diwemîn lîste ya ku li ser rewşa pirsgerêka kurd li sûriyê radestî serok wezîrê hikumeta sûriyê yê wî wextî (ebdulreûf el kesem) kiriye.

Berhemên çapkirî ev in :

- 1 – Govendek Helbest. Helbest 2009 Z.
- 2 – Bûka Helbestan. Helbest 2022 Z.
- 3 – Landika Helbestan. Helbest 2023.

Xelat û bawernameyên ku wergirtin ev in :

- 1- Xelata helbestvan mela Nûrî yê Hesarî ji Y.N.R.K.S
- 2 - Xelata helbestvan Emerê Lalê ji malbata wî.
- 3 - xelata sipasnameyê ji rêkxirawa canî roj.
- 4 - Xelata rêzlegirtinê ji şaxê Duhokê yê yekîtiya nivîskarên Kurdistanê Sûriyayê sala 2022 Z .
- 5 - Xelat sipasdariyê ji rêkxirawa (NRC) ya Emrîkî.
- 6 - Xelat sendîka hunermendên Kurdistan - Rojava.

HELBESTVAN Û NIVÎSKAREKÎ KURD LI BAJARÊ HEWLÊRÊ KOÇA DAWIYÊ KÎR

Helbestvan û nivîskarê Rojavayê Kurdistanê mamosta Mûsa Zaxuranî yê navdar bi (Bavê Gulê) li Hewlêrê li Başûrê Kurdistanê koça dawî kir.


Roja Sêşemî 28ê Sermawezê, helbestvan û Nivîskarê Kurd, endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriyê Mamosta "Mûsa Zaxuranî" yê naskirî bi (Bavê Gulê) li Hewlêra Paytexta Herêma Kurdistanê koça dawî kir.

Xwedêjêrazî mamosta "Mûsa Zaxuranî", yê xelkê devera "Qamişlo" a Rojavayê Kurdistanê li sala 1955 li gundekî nêzîkî "Qamişlo"yê li malbateke kurdperwer de jidayîk bûye.

Xwedêjêrazî mamosta "Mûsa Zaxuranî" ji sala 1968an ve dest bi karê siyasî û nivîsînê kiriye û karê mamostatîyê (perwerde) kiriye û 3 pirtûkên çapkirî hene, bi hegera nexweşiya xwe li temenê 68 saliyê de, îro Sêşemî 28ê Sermawezê 1402 a Rojî, li nexweşxaneyê bajarê Hewlêrê de koça dawiyê kir.

Koça dawî a wî rewşenbîrê Kurd xisarek bû bo çand û wêje û pênuşek ji mala yekîtiya nivîskarên Kurd kêm bû.

Bila rihawî şad be û serê gelê Kurd sax be.



Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

Qedera birayê şehîd “Fercad Derwîşî” piştî derbasbûna nêzî 2 mehan hêj nerohn e

Piştî derbasbûna nêzî 2 mehan ji binçavkirina “Seyad Derwîşî” yê birayê şehîd “Fercad Dewîşî” ku li girtîgeheke ewlehî ya rejîma Îranê de ye, qedera wî welatîyê Kurd hêj rohn nebûye.

Pêka rapora Rêkxirava Mafê Mirovî ya “Kurdpa”yê, heta niha qedera birayê şehîd “Fercad Derwîşî” yê bi navê “Seyad Derwîşî” nerohn e û navbirî tevî ku heta niha ji mafê parêzer bêpar bûye, ji hevdîtin digel malabata xwe jî hatiye bêparkirin.

“Seyad Derwîşî” li rojên destpêkî yê meha Xezewera Îsal, ji aliyê hêzên ewlehî yê rejîma Îranê ve bi bê hebûna ti belgeyêke yasayî li şeqameke bajarê Urmîyê de hate girtin û bo ciheke nexuya hate veguhastin û tevî lipeyketinên malbata wî, heta niha jî qedera “Seyad” nerohn e.

Heta niha ti zanyariyek li derheq sedema binçavkirin û tohmetên sepanî bi ser “Seyad Derwîşî” li berdest nîne.

Şehîd “Fercad Derwîşî” ê temen 23 salî û xelkê bajaroka “Balo”yê li demjimêrên şevê Sêşemî 29ê Xermanana 1401 a Rojî li pêvajoya şoreşa “Jin Jiyan Azadî”yê de bi sedema teqeya rasterast a hêzên serkutker ên ewlehî yê rejîma Îranê li şehreka “Welîesir” a bajarê Urmîyê, hate şehîdkirin.



Xwendevanek Belûç li jêr îşkenceyên spaha pasdaran de, canê xwe ji dest da

Xwendevanekî Belûç ku li jêr îşkenceyên hêzên îtîlaata spaha pasdaran a terorîst li girtîgehê de kevtibû rewşa komayê, piştî derbasbûna 3 heyvan, canê xwe ji dest da.

Pêka rapora “Halveş”, roja Duşemî 20ê Sermawezê, xwendekarê 19 salî yê Belûç, “Mehmûd Rexşanî” yê kurê “Îbrahîm” ku li jêr îşkenceyên hêzên îtîlaata spaha pasdaran a terorîst de derbên giran bi serê wî dabûn, kevtibû reşa komayê û piştî derbasbûna derdora 3 heyvan canê xwe ji dest da.

Pêka gotina kesên nêzî vê malbatê, “Mehmûd Rexşanî” ê xwendevanê sala dawî ya xwendîngeha “Husêynî” li şeqama “Baqirî” ya bajarê Zabolê bû ku li roja 12ê Xermanana Îsal, hêzên îtîlaata spaha pasdaran êrîş kiribûne ser mala babê wî û bê hebûna ti belgeyêke yasayî, bi hêceta lêgerin li pey çekê, mala wî vekolîbûn û tevî peydanekirina ti çekê “Mehmûd” digel xwe biribûn.

“Mehmûd Rexşanî” li jêr îşkenceyên hêzên îtîlaata spaha pasdaran de derbên giran bi serê wî kevtibûn û ew ciwanê Belûç bi sedema wan derbeyan, kevte rewşa komayê.

Hêjayê gotinê ye ku hêzên hov û dije mirov ên spaha pasdaran piştî şehîdbûna “Mehmûd”, givaş xistine ser malbata wî ku nabe ti skalayekê li dijî wan tomar bike û divê rizayetê jî bide û ew malbate neçar kirine ku bo dana termê zaroka wan, rizayetnameya nivîskî wajo bikin û gef li wan xwarine ku nabe kuştina wî ciwanê Belûç, bê mîdyayîkirin.



Kolberekî Kurd bi sedema teqeya hêzên rejîmê hate kuştin

Roja Duşemî 27ê Sermawezê kolberekî Kurd yê bi navê Elî Qadirî temen 52 salî kurê Mihemed û xelkê Merîwanê li encama teqeya rasterast a hêzên çekdare rejîmê li ser sînorê Merîwanê hate kuştin.

Li gorî nûçeya Ajansa Nûçegihaniya mafê mirove Kurdpayê, hêzên çekdare rejîma Îranê bi bê agehdarkirina berê li dema vegehin ji kolberiyê li devera sînorî a Asnawê û Merane, teqeyê wî kolberî kirine.

Herwisa Kurdpayê ragehand, ev kolberê Kurd bi sedema berkeftina 3 guleyan bi singê wî canê xwe ji dest daye.

Ev kolber xelkê gundê Zinûrî ê ser bi bajarê Merîwanê ye, herwisa xîzandare û xwediyê 4 zarokan e.



Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (460)



YELDA

ŞEVA JIDAYÎKBÛNA RONAHİYÊ



Partiya Demokrat A Kurdistanê Îranê
Navenda Ragihandinê